# Çîrokê Xwedê

**Destpêka temam**

- Xwedê dinya afirand, û mirovên yekemîn Adem û Hewa jî.
- Wî herwiha bihuşt çekir, Baxçe Eden, u azadî da wan jibo xwarina ji her darekê – ji xeynî darekê bi navê qenc u gûneh. Xwedê ji wan re got: eger hûn jê bixwin, hûn ê bimirin.
- Her tişt temam bû: qet mirin û şerm tûnebû, û wan her û her jiyan dikir.

**Gûneh u şerm ketin dinyayê**

- Şeytan hat û da kirin Adem û Hewa ji dara qedaxe bixwin.
- Di cih de ew ditirsiyen û şerm kir jiber ku wan taziya xwe dît. Jiber vê yekê wan xwe bi pelên daran nixumandin û ji Xwedê xwe veşartin.
- Xwedê jiber guhnedana wan ceza da wan, ku derkevin ji bihuştê, û her wiha jiyana wan ya bêdawî tûnebû.
- *Tiştekî balkeş:* Adem û Hewa tenê gûnehekê piçûk kir, lê qiyameta mezin li wan hat kirin: jiyana wan ya bêdawî tûnebû, û bi Xwedê re hevaltiya wan şikestî bû.

**Nixumandinek jibo gûneh u şerm: cilên nu û Xilaskerekê**

- Xwedê ji wan hîna jî hez dikir u tiştekî balkeş kir: wî cilên wan ji pelên daran guhartine meşkên heywan.
- Diviyabû heywanek were kuştin jibo gûnehên Adem û Hewa.
- Xwedê ev qurbanê yekemîn da. Di wan salan din de pêxemberan jî qurban kirin: Nuh, Ibrahim, Musa, Dawud…
- Xwedê soz da ku ew ê xelaskerekê taybet bişîne me.
- Pêxemberan derheqê vê xelasker de ya ku bi navê “Mesih” tê zanîn, agahî da: ew ê zora gûneh û şerm bibe, û nîşan bide ku em çawa dikarin bi Xwedê re hevaltiyekê baş bikin.

**Îsa Mesih**

- Dayika Îsa Mesih Meryem bû, ku bi tu zilam re têkiliyên we nebûn. Îsa jî bi “Mesih” û “Peyva Xwedê” bi nav bû.
- Wî ji xelkê hez dikir, tu gûneh ne dikir, tu mal li xwe kom ne dikir, û tu kes nekûşt.
- Wî mûcizetên mezin kirin: nexweşî baş kirin, şeytan der xist, û kesên mirî rakirin.
- Wî hin kir ku Xwedê çawa dixwaze em jiyanên xwe bikin: divê em gûneh nekin û li gorî gotinên Xwedê tevbigerin.
- *Tiştekî balkeş:* dema ku ew ne mezin (ciwan) bû dest bi pêxemberiye kir: “divê ez bimirim, lê ez ê ji nu ve rabim.”
- Pêxember Yûhena ew dît u got: “Binerin, Berxê Xwedê, ye ku gûnehên dinya diweşîne.” (*Ev balkeş e, ne wisa?* Berx wekî qurban tê bikaranîn.)

**Qurban jibo me**

- Îsa qet gûneh nedikir, lê hin kes ji hinkirina û tevgerîna wî hez nedikir. Dijminên wî ew girt û îdam kir. Berxwedana wî tunebû, û bûye qurban, qurbanê Xwedê, ya ku jibo gûnehên me miriye.
- Piştî sê rojan Xwedê ew rakir, wekî Îsa soz dayibû.
- Bi vî rengî mûmkin e ku gûnehên me were efû kirin: divê em bawer bikin ku Îsa li dema mirîna wî li gûnehên me buhartiye, û paşê Xwedê ew rakir.
- Dema ku em wisa bawer dikin, Xwedê yê jiyana bêdawî bide me. Em dikarin di serweriya wî de jiyan bikin, û dema ku em ê bimirin hîna jî bi wî re bin.

**Ruhê Xwedê**

- Xwedê dixwaze ku em jiyanekê bêgûneh bikin û mînakê Îsa bişopin. Lê em nikarin bi tenê xwe wisa bikin. Em her tim dikevin.
- Pêwistiya me bi alîkariya Xwedê heye. Ew dixwaze Ruhê xwe bide me, da ku dilên me bigûhere.
- “Ruhê Pîroz” wekî hêza Xwedê ye, û alîkariya me dike da ku xwestina Xwedê fahm bikin, bibin mirovên baş, û Şeytan nehelin.
- Xwedê Ruhê xwe dide her kes ya ku daxwaz bike.

**Balkeş e, ne wisa?**

- Adem u Hewa cezayê îdamê stand, her çend ku wan tenê gûnehek kir.
- Xwedê di nav qurbanekê re cilên wan guherandin.
- Nave Îsa “Berxê Xwedê” bû.
- Îsa derheqê mirîna xwe de pêxemberiye kir.
- Îsa jiyana xwe ji dest da, lê piştî sê rojan Xwedê ew rakir, wekî wî berî got.
- Xwedê Îsa wekî qurban jibo me şand.
- Xwedê dixwaze Ruhê xwe bide me.

**Çawa dua dikin da ku Îsa Mesih wekî xilaskerek qebûl bikin**

- Xwedê, ez hatim ba te. Ez dizanim ku di jiyana min de gelek gûneh hene. Ez tobe dikim, û hêvî dikim ku tu yî li min biborî.
- Îsa Mesih ez li te bawer dikim, û hatim ba te. Ez te spas dikim jiber ku tu xwe ji min re bûye qurban.
- Îsa Mesih, ez te wekî qurban, xilasker u Xudan, qebûl dikim. Ez jiyana xwe didim te.
- Min bi Ruhê te dagirî u alîkarya min bikî da ku bijim wekî çawa tu dixwazî.

**Bersiva min ji Xwedê re**

Xwedê ya xwe temam kir, niha dora te ye...

Min teklîfa wî qebûl kir?
□ Belê □ Na

Gelo ez amin im ku min jiyana bêdawî qebûl kir?
□ Belê □ Na

Gelo ez amin im ku min Ruhê Xwedê qebûl kir?
□ Belê □ Na

**Biryara min:**

Li ________________ *(dîrok)* min got ‘belê’ jibo teklîfa Xwedê li Îsa Mesih. Min xilasker Îsa Mesih wekî qurbanek qebûl kir, ji ber ve çendê li gûnehen min hat buhartin.

Xwedê min qebûl kiriye, û Ruhê xwe daye min. Ev rûmeta (şeref) min e ku jiyana min bidim wî, û dest bi jiyana bikim wekî çawa ew dixwaze.